LEC

Munzur Çem

Wexta çûyînê nêzîk bû, Memo, bi dilekî sar ji cîhê xwe hêz da. Saqoyê xwe yê ku du mirovê wekî wî têda bi cîh dibû, ji bizmarê dîwar anî xwar, li xwe kir, gorê xwe yê rîs kir pîyê xwe, kumê xwe kişande serê xwe û egala ku nasê Xelat dabûyê li stuyê xwe aland, berbi derî çû. Hê derî venekiribû, dîya wî weke rojên borî li pêş sekinî. Bi nezera hizkirinê sermilê wî girt, serapê lê mêzekir. Destê xwe li serî gerand, kontrol kir ka guh û stuyê xwe rind pêçaye an na. Paşê derî Hêpir vekir û li benda derketina wî sekinî. Memo, xwe berda kuçê û bi lez çû. dûr neketibû, dê ji pişt va gazî kir, got:

_Her der qeşa ye. miqatê xwe be ez bi qurban! Li deran zêde nesekine, zû vegere were mal.

Memo hinek sekinî û li ser milê xwe zivirî:

_ Temam dayê, li ber nekeve, hema karê min xilas bibe ez li mal im; tu rind bizanibe. paşê kete ser rê û çû.

Rê bi qeşa, der û dor jî hatibûn girtin. Memo lingê xwe di kortikan da rind bi cîh dikir ku ne şemite; gava ku meys didît, xwe bi dîwarê xanîyên kêleka xwe va digirt.

Li Qerekilîsê seqemekî bi tirs hebû. Sermakî wesa bû ku, Memo wetrê qey derzîya di sûretê wî yê tazî ra radikin. Çavê xwe çarnikal li dora xwe gerand, guhê xwe mûç kir, dît ku tax bêdenge.

Carna ji çirîna derîyan, ji dengê lingê mirovên ku ji kuçan derbas dibûn û ji dengê zarokên ku li der û dor dilîstin pêştir deng tunebû. Lê bêdengîya kuçê bi van dengan jî nedihate xirabkirin. Avahî kambax bûn, ji mirov wetrê qey bi erdê va zeliqîne.Dûyê sergîna, weke stûnan ji hin kulekan dikişîya, belav dibû, wek konekî mijê ser bajêr digirt.

Gava ku kuçê xilas kir kete ser rê (cadde), bajar tiştekî,ş ên bû. Êdî mirov zêde diçûn û dihatin. Dema ku ji ber derê çayxanan derbas dibû, qîje_ wîjên bilind dihatin guhan. Taxûkên yekhesp girêdayî, bi xuşînek zîz ji serê rê heta dawîya rê di nav berfê da dişilikîn. Qeşa, weka rêşîyan bî birî û simbêlê ajotvanan va zeliqîbûn. Ewana çavên xwe her li mişterîyan digerandin, wekî din tiştek nedikete bîra wan, qerisîbûn û her tişt ji bîr kiribûn.

Memo, demek weha bi rê da çû. Ew û hevalê xwe yê Misto tam di wextê da rastî hev hatin. Ev ne rasthatinek xwe bi xwe bû. Li wê taxê ewana, timî di wê saeta rojê da hevdu didîtin. Ne ew ne jî yê din, armanca çûyîna xwe ji hev venedişartin. Lewra armanca herduyan jî yek bû û bi hev zanibûn.

Bi xeberdan heta dawîya rê çûn. Îkil nehatibû guhurandin, weke rojên berê bû.

Li holê sergoyê esker, li ser sergo çend se (kûçik) sekinîne, li dora wan çend zarok civîyane û li pişt zarokan jî çend seyên birçî sekinîne. Tev bi hevra li cîhek dinihêrin_ li hêvîya bermaya xwarina esker bûn_ ku bînin ser sergo.

Wext sekinîbû, zû bi zû derbas nedibû. Mirov wetrê deqqe pêşda naçin. Ku ereba bermaya xwarinê dereng biketa. Seqemê zêdetir li wan hukum dikir. Ji sermayê, tilî û pêçîyên dest û lingan çiqas diçû ditevizîn. Netika tazî û sûretên vekirî jî, ji ber sermayê weke wan jan nedida. Lê pir mixabin, zarok li dij wê seqema hişk di berxwe didan. Digerîyan, berî hev didan û bi hev dilîstin. Carna jî, yekî dengxwe,şkilam digot yên mayîn jî lê vedigerandin, an bi destê hev digirtin an jî dest didane ser milê hev û govenda Kurdî dilîstin. Ev yek li dora sergo helqeyek çêdikir û dibû tevgereke giran.

Gava dengê hate! hat bihîstin, govenda wan a geşbûyî di cîda sekinî. Gişka li yek nuqteyek dinihêrî, li ereba esker a ku dihat! Îahî û kêfa wan piçek revîya, mirûz kirin û dilsar bûn. Reng li teva xirabû, madê xwe kirin û ji hev dilsar bûn. Hezkirina hevaltîyê ji bîr kirin, danîne alîkî û li hember hev sekinîn weke hêkeleke cemedê.

Memo li sergoyê, li bermaya xwarinê cardin rind mêze kir.Cîhekî rind ji xwe ra kifşkir. Paşê li hevalên xwe yên lecê nihêrî. Dilê gişka hebû weke wî berevkin. Gişk weke tîrê kevanê amadeyê lecê bûn. Lê belê seyek xayîn li milê rastê yê Memo sekinî bû. Rewşa wî ne baş bû, awirên wî wek dijmin bû. Çavên wî yên bi xwîn qet û qet bawerî nedida Memo.

Memo kir ku cîhê xwe biguhêze, ji xwe ra cîhek din kifşke. Lê belê cardin poşman bû.

Wext êdî derbas bûbû. Ereba esker nêzîkahî bi sergo kir.

Cîguhastin êdî feyde nedida. Memo nedixwest destvala vegere mal, pêwîst bû tiştek xwarinê bi xwe ra bibra mal. Gava serê sibê ji mal derket, dê pişt va gazî kiribû: Lao, li cîkî nemîne, zû vegere mal! Gelo çima? Tenê ji bo Memo bû ev gazîkirin? Nexêr, lewra birayên Memo di mal da birçî bûn. Memo, ku weha dûr û dirêj difikirî birayên wî hatine ber çavan. Xeyal kir, wana yeko yeko ber çavê xwe ra derbas kir, li wana û halê birçîbûna wan nihêrî. Dilê wî şewitî, çavên wî xumam girt.

Hetanî dawîyê di wê halê da wisa ma. Lê belê gurîna erebê wî ji wan xeyalan şîyar kir. Hişê xwe anî serê xweû li ereba ku nêzîkê sergo dibû cardin mêze kir.

Erebe sekinî. Dergê, ofêrxanê vebû, sereskerek (onbaşi) ûês esker xwe ji erebê avîtne jêr. Eskeran tev bi hevra awirên tûj dane zarokan. Wana, weke rojên borî tiştek ji wan zarokan ra negotin. Lê pir mixabin, fesalên wan irabûn.

Awirên serdest yê weke mêra, êdî zarokan dîn_ har dikir.

Leşkeran paşê bîdonan serdev û rû berjêr kirin, bermaya xwarinê vala kirin û çûn. Pey çûyîna wan, leca jîyanê li ser sergo destpêkir. Seyên birçî, yan hestiyek yan jî kerîkî nan zûzû hildidan dikotin û dixwarin; dest û lepên zarokan, weke makînan diçûn û dihatin. Memo, cara ewilîn kerîyek nanê mezin dît avête tûrê xwe. Gava ku ewî, wî nanê bi şabûn avîte tûr, di gemarê da kerîkî mezintir ket ber çavê wî. Wek cara pêşî berbi wî nanê jî hat ku hilde. Lê belê ji bo hilanîna wî kerîyê gir ew tenê ne bû. Seyê gewr yê gir jî, li ber wî nanê xwe telandibû. Yekê bi dest, yekê jî bi dev xwe bi hevra avîtne nan. Çavê seyê gewr, ji qasek berê zêdetir xwîn girtibûn; weke dijmin dinihêrî. Nan hîşt. ji nişkava rahêla Memo, diranê xwe yên tûj di destê Memo da derbas kir. Memo nizanibû çi lê qewimî, him garîya û him jî xwe ji para kişand, ku ji se xilas bibe.

Lê pir mixabin, zêde di ber xwe neda, ew berxwedan ji êşê zêtir tişt neanî.

Memo di nav wê êş û tirsê da, bi destê xwe yê din kulmeke zexm li serê se xist.

Se, Memo berneda. Bi hêrsekî mezin li vî alî wî alî bir û anî, qîlê (diranê) xwe di bedena wî da diçikand. Bi her xîlçikandinê ra Memo, xwe dicivand ser hev, goşt ji bedena wî diqetîya û xwîn jê dikişîya. Gava seyên din jî çav bi xwînê ketin, weke gurên har bû xirîna wan û êrîşî ser laşê

Memo kirin.

Piştî demekî kurt her tişt xilas bûbû. Li ser sergo Memo, di nav xwîn û gemarê da bûbû kerî kerî. Ne dikaribû vegere mal ne jî tiştek xwarinê ji birayên xwe ra bibe. Ji bo kerîyek bermaya xwarinê, jîyan li Memo hatibû dawî.

Memo, lec wunda kirîbû.